

## Nûçe û kurte nûçe

Di 20-11-2010 an de, sekretêrê El-partî yê berê, Hec Dehamê Mîro, ji dinyayê barkir. Birêz Deham ji sala 1970î ve ta 1973an, serketêrê El-partî bû û di Havîna 1973 an de, tê girtin û şeş sal û heşt heyvan di zîndanê de dimîne . Bi vê boneyê, komîta weşana Newrozê birûska jêrîn rêkir.

## Birûsk

Malbata **Hac Dihamê Mîro...**

Bi xemgînî, me nûçeya koçbarkirina xebatkarê Kurd ê navdar Hac Dihamê Mîro bihîst û em xwe hevparê şîn û behiya we dinasin.



Li ser riya azadiya gelê me, riya xebatê dij pirojeyên nijadperest û siyasetên pişaftina gel û zimanê me, **Hac Dihamê Mîro**, digel hin hevalên xwe, di rojên tirsê de, rojên dijwar û tariyê de, kar û barê kurdariyê hilgirt ser milên xwe û bi mêranî jê re xebat kir. Ji ber û bîr û baweriyên xwe yê kûr bi dadmendiya doza Kurd li Sûriyê, sala 1973an, ew û hin hevalên xwe, ji ber belavkirina daxuyaniyekê bi navê Partî dij pirojeya **kembera Erebî** ya nijadperest hatin girtin û çend salan di zindanê de man. Bila cihê wî buhuşa rengîn be! Bila serê we û Gelê Kurd sax be!

**Komîta weşan NEWROZ**

04.11.2010Z-2622K

\*\*\*\*\*

**Cejna Êzdî li hemû Êzdiyan pîroz be**

Bi hatina cejna sersala rojiya Êzdî, Em hemî Kurdên Êzdî pîroz dikin û em dixwain hemî roj û jiyana we cejin û şadî bin .

## Nûçe û kurte nûçe

**Nivîskar Selah Berwarî koç barkir**

Di 26ê Çirya Paşîn de, li dûriyê, bajarê Şamê, dilê nivîskar, wergêr û rojnemevan Selah Berwarî rawestî.



Kewranê termê wî ji Şamê, berve çiyayê Kurmênc-herêma Efrîn, gundê Maratê-bi rêket. Bi beşdariya dost, berketî û xwediyên xanima

wî, di goristana gundê Maratê tê veşartin. Piştî veşartinê, endamê ji endamên şevbihêrkên Şamê çend peyvên li ser sinciyên birêz dike.

Birêz Selah Berwarî ji parêzgeha Dihokê, Kurdistanê Îraqê ye, di sala 1957 an de ji dayîk dibe. Ji sala 1991 an ve, li paytexta Sûriyê- Şamê-berpirsiyariya ragihandina partiya Yekîtiya Niştîmanî a Kurdistanê dike.

Hêjayî gotinê ye ku, birêz xwedî pir berheman e, wek: Serhindana Agrî, Biranînên Îhsan Nûrî Paşa... ji bilî gotar û lêkolînan.

Bi navê komîta rêvebir ya weşana Newrozê, serê xanim, zarok , heval û dostên wî saxdikin.

\*\*\*\*\*

## Siyasetvanê Kurd Reşîd

## Hemo koçbarkir

Êvara roja Înê 17 ê Berçile 2010 an, li ser riya **Heleb – Qamişlo** , bi bûyereka turimbîlê , Siyasetvanê Kurd ê nasdar Reşîd Hemo bi temenê 85 salî



koçbarkir û çû dilovaniya Xewdê,.

Nemir ji gundê Hopika – Raco- Herêma Kurdaxê (Efrîn) – Parêzgeha Helebê – Sûriyê ye , yek ji kesên ku Partiya Kurd a yekem li Sûriyê di Havîna sala 1957 an de damezrandine ye . Herweha ew kesekî welatperwer û mirovhez bû , ji ber doza kurdî û zanîna de demek dirêj derbas kir û pir xebitî .